Hozan û siyaset-kole û ezbenî

Ferhad Hacî - Zaxo

Bê dudilî em dişên bibêjin ku havlî û hevbendiyeka berçav di navbera hozanê û siyasetê de heye û ev çend e ne xuyakirinek nû ye, lê xala dilêş ew e, hevbendî di navbera hozanê (weku hunerê rastyê) û siyasetê de (weku hunerê direw û xapandinê) dê bi çi reng be? Bêgumane ku her gaveka hozan bi ser siyasetê de zalbû hîngê dê tiştekê ciwan û nazik serhilbide û berûvajî ango gava siyaset bi ser hozanê de zalbû li wî demî dê tijî guhên hozanvanên dahêner mirin û nexweşî be û bi dehan lêbok û dahol qut dê peyda bibin wekî diyarbûna pirzikan li ser alekên xortan.

Bi giştî:

Du xal di hizir û eqlê hozanvan, rewşenbîr û nivîskaran de hene:

1 -heger hozanvanî (rewşenbîr û nivêskar) di gel bayê dilê siyasetvanan (desthelat) xwe berda û di gel

HELBEST

wan li paporê siwarbû li wî demî hozanvan dibe kirêgirtî (mirtziq) çunku yê li papora siyasetvanan (desthelat) siwar be hemû xwestekên wî bi cih dihên ji derzîkê û heta rûkêtên xweşiyan wekî (peydakirina nanî, xanî, tirumbêlê û kursîkên biryarê û mêzên qumar û meyê û nivîstin di gel periyên deryayî yên nejad kurd, surî, îraqî, lubnanî û terxankirina destgehên ragehandinê û maykên festîvala û hemû pilatformên rewşenbîrî bo helbest û tiyorên hozanvanê li paporê siwar bûyî).

Û bila em ji bîr nekin ku gelek hozanvan hilgirên îdyolojiyek siyasî bûne û hindekan mizgînîkarî bo îdyolojiyek siyasî dikirin û dikin û hindekên dîtir xwîna xwe ji bo îdyolojiyek siyasî rijtin û hatine zîndankirin û nexweşî dîtin. Li vê derê baş e em bibêjin ku hijmareka desthelatdar û nivîskar û hizirvanan hozanvan bûn wekî:

Hizirvanê navdar Karl Marks, rêberê Çînê Mao Stong, rizgarkerê Vîetnamê Hoşî Mîn e, serokê Senîgal Singur, her wesa xwînkarê dînê îslamê (elwelîd bin yezîd) li ser zikî hate xişandin di nav kolanên Dîmeşqê de ji pêxemet hozanên wî û zêdebarî mîrekê ereban bi navê Seyif Eldewle Elhemedanî ku hozanvanek berniyas bû belê di ser hindê re jî hozanvanê mezinê ereban Elmw-ten-ebb-y ji kêlb, penc û niyazên wî revî.

2 -Heger hozanvanî (rewşenbîr û nivîskar) xwe di qaçê re asê kir û xwe dûrî germatiya siyasetê kir hîngê dê ji sarma bimire û heger jiya dê bimîne dîlê xeman û nebûna pêdivyên jiyanê û dibe desteserê başkirina rewşa xwe û xêzana xwe. Kêm hozanvanan şiyayne hember pêla hevdij rabiwestin û xweşiyên siyasetvan (desthelat) peyda dikin qebûl nekin. Bo zanîn bi dirêjahiya dîrokê û heta evro hozanvan hebûn û hene bi siyasetê, bûne xwedanên kultûrê gelê xwe û dîroka hozanê di qelemên wan de kurtkirî ye û pîçeka mayî dê tiyorê li pişt mêzeyan bikin wekî ragehandin wan diyar dike û belku hozanvanên ji wan baştir hene yan jî hebûn di jûrên xwe de yên banê wan ji çînkoyê û axê çêkirî mirine û kesê pariyekê nanî pêşkêşî wan nekir çunku:

A-Li hember siyasetê xwe bernedan ser çokan.

B- Bi duristî di jiyanê negehiştin û davên girêdanê di navbera qonaxên dîrokê û hêlên gişti yên siyasetê û cûnê hozanê de nedîtin yan jî nexwastin.

Duhî û evro û heta sube jî tiştekê normal e havlî û hevbendî di navbera hozanê û siyasetê de hebe çunku

HELBEST

neberaqil e hozanvan (bo nimûne hozanvanê kurd) di civakî de bijît û hest bi dewleta kurdî neke ewa di sala 1991-ê ji dayik bûyî yan jî hest bi pirsgirêka kurdî neke li parçeyên dîtir yên Kurdistanê... htd. ji kêşeyên siyasî. Lê giring e hozanvan pêkolê bike pirekê çêbike ji bo giştîkirina xemekê yan her kêşeyeka hebe û aşikiraye hozanvan pitir ji mirovên dîtir li azadiyê û yeksanyê digerhe di nav esmanê paqij de û heta di nav tenekeyên gilêşê jinkên pitpitî de li taxên (RûtaZaxo) û (berojkê-Dihok) ê, ji vê yekê hozanvan rû bi rû siyasetê dibe.

Di kultûrê rojhelatî de her ji kevn de û heta belavbûna van çend rêzan hêj siyaset bi ser hozanê de zal e, siyasetvan caran xwe dike babê hozanvanî, û caran xwe dike jêderê wî û caran dibe ezman sorikê wî û caran dibe (wekîl erzaq) ê wî û ya ji hemûyê kembaxtir ew e mayê xwe di pitiriya kar û hûrhûrikên jiyana hozanvanî de dike her ji destnîşankirina rengê şortê wî ji bo melevanîkirinê û heta dana pesendekê bo berbûkiyan ku li şahiya hozanvanî tilîliya vedin, û piştî salekê jî giring e nexiryê hozanvanî di koşa wî siyasetvanî de bihê sunetkirin da ku tafîl bibe û xweşî jê re peyda bibe.

Ango em dişên bibêjin li rojhelatî (cihê pêxemberan) hevbendî di navbera siyasetê û hozanê de wekî (benkê li dû humbanî ye), bi gotinek dîtir hozanvan koleyê siyasetvanî ye, di pirtûka (elzîne) ya erebî de wesa dihê gotin ku:

Di serdemê (cahlî ye) ê de hozanvan di nav ereban de li heman rêza pêxemberan bûn di nav gelan de û gava têkelî di gel bajêriyan kirin, hozan kirine jêderê peydakirina nanî. Lewa ji wê rêza pîroz hatine xwarê, paşî îslam û quran hatin û sivkatî bi hozanê kirin û bi direw li qelem dan evca hozanvan pileyeka dîtir hate xwarê, paşî ewan bi xwe jî hozan kirine hunerê xweşirînkirin û xwastinê, lewa di çavên xelkê de kêm bûn.

Pa em?

Carê milletek wekî kurdan ku di sedsalên bîstê de bêbehr bûye ji hemû mafên xwe yên siyasî, civakî, aborî, rewşenbîrî û mirovatî... htd. û ji encamê dagêrkirina Kurdistanê kurdan tam kirine hemû cûnên nexweşiyan û dijminatiya hemû hêviyên wan dihate û dihête kirin, di wî barî de xwe bi xwe hozan û siyaset têkel bûn ango hevbendiyeka qayim di navbera hozanvanî û siyasetvanî de hebû û hevbendiya wan ne hevbendiya (benkê li dû hembanê) bû çunku sitem û

HEVBESTÎ

zordarî li herdûyan dihate kirin mil bi mil di gel hemû texên dîtir yên civakê kurdî, ango em dişên bibêjin ku sîstemê hizirkirina wan li ser binemayê siyasî bû, bi gotinek dî em dişên bibêjin ji encamê nebûna dewletek kurdî (ku bîst saleka li ber hurebay rabiweste û dezgehên xwe yên cûrewcûr dabimezirîne... htd) û nebûna diktatorekê kurd ku stemê bike û dewleta kurdî li dû hizir, hez û boçûnên xwe û rawêjkarên xwe bajot wekî karwanekê dewaran û hebûna dagêrkeran ku li şûna wî sitem dikir di wî barî de hozanvan bûne du cûn:

1 -Hozanvanên hozan kirin dîlê siyasetê û xwe bi qelem û bi siroşa helbestê ve firotin dijminî wî cûrê hozanvanî hozana kurdî hînan nizmtirîn ast (her çend e belku ferhenga zimanê kurdî zengîn kiribe û hindek peyvên kurdî yên resen ji mirinê parastibin û bi dîwanên hozanên pirtûkek li pirtûkxaneya kurdî zêdekiribin) van cûr e hozanvanan li Kurdistana Îraqê di sala1988-ê helbest li dor bejn û bal û çelengî û qadsiya Sedam Hisên vehandin û dikirine qêrî û li Kurdistana Îranê û di heman sal de helbest li dor îmandariya raberê dînê îslamê Xumeynî vedihandin û di ber re dikirin girî, û di wî demî de kurd di agirê herdûyan de dihatine sotin û wan cûr e hozanvanan bizava nemirîbûn û zîndîbûna dijminên kurdan dikirin û mizgînîkarî bo armancên dagêrkeran dikirin..

2 -Hozanvanên siyaset bi kilka helbestên xwe ve girêdayin, çeper ji bo berevanîkirin ji peyva kurdî û hêviyên gelê kurd, van cûr e hozanvanan her dem birîna milletê xwe hembêz dikirin ango karê siyasî dikirin. Lewa bi sanahî dihê têbînîkirin ku Hafiz Qazî û Miweyed Teyib û Bedirxan Sindî û Ebdulirehman Mizwîrî û Mihsin Qoçan... htd di salên şêstan û pêde binemayê hizirkirina wan siyaset bû bi rengekê paqij. Belê piştî serhildana 1991-ê guhorîn peyda bûn li ser hemû astan (rewşenbîrî û siyasî û aborî... htd.) û di ser hindê re jî hindek hozanvan mane li ser êk û dûya xwe ango bûne zelam û hozanvanên hizban û kiteka kêm mane bê layen û di gel de jî mane bêdeng û reng û paşeroj û tirumbêl û xanî û mûçe û... htd. Xwezî hozanvanên xwe dûrî têhin û germatiya siyasetê kirin heger hebin û mayin hevalên neteweyê xwe bi hindek mafan şad bibin ewên hozanvanên hizban jê dixwin.

Hindek pêzanîn min ji van jêderan wergirtin:

1 -Hoşeng Şêx Mihemed, derçûn ji desthelata manaêy-xwandinek bo binemayên giştî yên şiîra devera Behdînan, Kurdistan-2005 .

2 -Nureldîn Bedran, fî elşir û elsiyase, elhwar elmutemedin/hejmar (968), 26/9/2004 .

3 -Beyan Sifedî, mihawelat fî fehim elşir.

UEI BEST